 Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

 wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 24

## Pêşiyên Kurdan û gênên şaristaniya Guzana

### Gênên şaristaniyê:

Zanîna hawîrdora pêkhatinê dergeheka pir girînge ji bo naskirina kesayetiya gelan. Mebesta me bi hawîrdora pêkhatinê ew erdnîgarî ye, ya ku ji heyamên kevirî da gel têda pêkhatine. Hawîrdora pêkhatinê bi xwe ra çanda pêkhatinê diafirîne û di çarçewa çanda pêkhatinê ya her gelekî da bîreweriya wî, rê û şopên fikra wî, nirxên wî û rewiştên wî pêktên. Em ji van tiştan giştan ra têgîna "gênên pêkhatinê" dibêjin.

Şans û bextê gelê Kurd baş bû ku hawîrdora pêkhatinê (yanê Kurdistan) ya ku di wêda kesayetiya kurdî pêkhat, zemîneka pir baş bû ji bo pêkanîna gênên şaristaniyê. Wan gênan kesê Kurd li her derê wisa amade kir ku bibe dostê şaristaniyê û nebe dijminê wê; ew berhemdarê wê bû û ticar hewlnedaye ku wê kavil bike û hilweşîne. Me ev mijar di pirtûka "Kesayetiya Kurdî, Lêkolîneka Sosiyologî" da, di bin sernivîsa "taybetmendiyên bîreweriya kurdî" da, bi berfirehî şîrove kir û belge jêra dan.

Da ku ev rastî baş bê fêhmkirin, divêt em ji wê herêmê destpêbikin ya ku zaniyarê arkêologiyê yê amerîkî Henry Breasted navê "*Heyva Berhemdar*" lêkiriye. Ev herêm ji herêmên rojavayê Asiyayê ya ji giştan bêhtir barana wê pire, kanî û çemên wê pirin; di wê da deşt û çiya li ba hevin, axa wê pir berhemdare û çar werzên salê bi rêz û li pişt hev, ji hev cuda ne. Van taybetmendiyan hişt ku ev herêm, ya ku li gor gotûbêja tewratî û qur'anî "**bihuşta Adene**", hên ji destpêka dîrokê da bibe landik û dergûşa şaristaniyê; di hembêza wê da yek ji şaristaniyên here navdar di cîhana kevin da peyda bibe. Mebesta me li vir "*Şaristaniya Guzana*" ye, û di hembêza wê şaristaniyê da pêşiyên gelê Kurd peyda bûn û ji wir da ber bi herêmên hevsê û tenişt belav bûn. Gelo ev çi şaristanî bû?




(Herêma Heyva Berhemdar pêş 7500 b.z)

## Erdnîgariya Şaristaniya Guzana:

Ev şaristanî li gor "*Girê Guzana*" hatiye binavkirin. Ev gir li kenara rastê ya çemê Xabûr dikeve; li başûr-rojavayê bajarê "Serê Kaniyê" yê rojavayê Kurdistanê ye. Wek navê pir herêmên kurdistanî, navê vî girî jî hate erebkirin û di jêderan da bi navê "*Til Helef*" hatiye gotin û ev şaristanî jî nav lêkirine "*Şaristaniya "Helef*".

Şaristaniya Guzana bi dirûvê kevanekî ku ji Mendelî da li başûrê Kurdistanê destpêdike heya bi çiyayên Toros li bakurê Kurdistanê, tevî pir berîk û girîfanan li bilindahiyên Anatoliyayê. Ev şaristanî di navbera salên 4400 heya 4300 b.z. da tê vemirandin[1].




(erdnîgariya Şaristaniya Guzana / Helef)

Dr. Mihemed Beyyûmi Mehran gotiye: "**Şaristaniya Helef di dema dawiya hezarsala şeşan û heya dawiya hezarsala pêncan b.z. dirêj kiriye. Belavbûna wê bi taybetî li bakur bûye; ji wê herêma ku ji çemê Zapê Jorîn û kuntarên çiyayên Zagros da li rojhilat destpêdike heya bi pişt çemê Fetar li rojava; heya bi sînorên Turkiyayê û kuntarên çiyayên Toros li bakur**"[2].

Kurtahiya agahdariyên derbarê *Şaristaniya Guzana* wisa didin xuyakirin ku piraniya herêmên ev şaristanî têda pêkhatiye di wê erdnîgariyê da ne ku pêşiyên gelê Kurd di heyamên kevin da lê bi cih bûne û heya niha jî Kurd li wan herêman dijîn.

## Diyarde û taybetmendiyên Şaristaniya Guzana:

1 - <u>Warê çandiniyê</u>: Rûniştivanên *Şaristaniya Guzana* bi çandiniyê xwerîk bûne. Belgeya vê yekê ewe ku dasikên paleyê yên ji kevirê çeqmaq bi sedan li vê herêmê tên dîtin. Mirovên wê herêmê ceh û genim çandine, deziyên ji giyayê kotan durist kirine, zeyt (rûn) ji giyayê kotan derxistine û ajelên wek bizin û mih (meř) xwedî kirine[3].

2 - <u>Warê çêkirinê (duristkirinê)</u>: Rûniştivanên *Şaristaniya Guzana* mis (baqir) bikar anîne, amanên kevirî durist kirine, seriyên teşiyan û nawelên (acetên) xwemil û xêzê çêkirine. Di duristkirina keviran da ji bo avakirina xaniyan pêşva çûne, ji axê qermîtên rengîn, tiştên wek mîx û mohran çêkirine û mohrên ji bo çapkirinê li ser heriya hişk, duristkirine. Hin berhemên ji mis (baqir) wek toplî û tevşoyan çêkirine, ji ber ku pir mis li herêmên Amed û Meletiyê hebûye[4].

3 - Warê avakirina xaniyan: *Şaristaniya Guzana* bi xaniyên gilover navdar bûye. Hîmê wan xaniyan bi gelemperî ji keviran bû û dîwarên wan ji ĥeriyê bû; ew ji odeyeka gilover pêkdikat û banê wê qabkirî bû, û derwazeyeka berdirêj li aliyekî wî hebû. Qermîtê *Şaristaniya Guzana* bi xemlên xwe yên rindik û rengîn dihate naskirin; hinek ji wan narincî, hinek qirmizî, hinek sor, mor û zer bûn. Nexşên wan hin dirûvên sêkoşe, çarkoşe bûn û hin xêzên rast û hinên xwar lê hebûn[5].

4 - Warê bazirganiyê: Bazirganiya Guzana berfireh bû û baş hatibû organîzekirin. Rûniştivanên wê cama volkanî ya reş ji herêma Gola Wanê anîne, sedef ji Oqyanûsa Hindî û Kendava Sûmerî (Farisî) anîne û qermît jî firotine herêmên din. Şopên *Şaristaniya Guzana* yên amanên malan û xemlên çêkirî ji Kendava Sûmerî (farisî) da bigire heya bi Derya Sipî hene[6].

5 - Warê Mîtologiya: Di *Şaristaniya Guzana* da peykerên xwedawendên dayîkî têne xuyakirin. Gorên wan bi giştî di bin erdê xaniyan da bûn. Cendekê miriyan datanîn ser milê rastê û seriyê wî bi aliyê rojava da dikirin. Di goran da hin nawelên kesayetî wek piyal û amanên wî yên xwarinê hatine danîn. Danîna seriyê kesê mirî di gorê da ber bi rojava da nîşana wê yekê ye ku aliyê rojhilat, aliyê rojê, pîroz dihate dîtin. Ev jî nîşana mîtologiya rojeyî (şemsanî) ye. Hebûna nawelên kesayetî di gorê da nîşana wê yekê ye ku rûniştivanên *Şaristaniya Guzana* bi hebûna jiyana piştî mirinê bawer dikirin[7].

Erdnîgariya *Şaristaniya Guzana* nawendeka kevin û petî ye ji nawendên pêkhatina şaristaniyê. Di çîroka *Tofanê* da hin belgeyên wê yekê hene. Di gotûbêja sûmerî da hatiye ku keştiya *Ziusudra* li ser çiyayî *Nisîr* (çiyayê Pîremegrûn) li başûrê Kurdistanê rawestiyaye. Li gor çîroka Tofanê ya tewratî keştî li ser çiyayê *Ararat* (Agirî) li bakurê Kurdistanê rawestiyaye, û li gor çîroka qur'anî li ser çiyayê *Cûdî* li nawenda Kurdistanê rawestiyaye. Ev hersê çiya jî di erdnîgariya *Şaristaniya Guzana* da ne[8].

## Du rastiyên dîrokî:

Ev belgeyên derbasbûyî du rastiyan piştrast dikin:

**Yekem**: Ku Kurdistan hên ji heyama kevirî ya kevin da warê mirovan bûye. Hin lêkolîneran rûniştivanên wê wek "*nijadê asiyanî*" bi nav kirine, û hinên din wek "*nijadê qefqasî*" bi nav kirine. Ya here rast ewe ku ew wek "*nijadê zagrosî*" bêne binavkirin. Ji ber ku erdnîgariya çiyayên Zagros û derdorên wan warê wan yê bingehîn bû[9].

**Duwem**: Xuyakirina destpêkên şaristaniyê li warê pêşiyên Kurdan hên ji heyama kevirî ya kevin da nîşana wê yekê ye ku mercên hawîrdorê li wê herêmê guncaw û minasib bûn, û ew merc di heyamên pişt wê ra jî berdewam bûn. Ji lew ra, tiştekî suriştî ye ku ew herêm bibe kana mirovan û ji wir ber bi herêmên tenîşta wê da belav bibin. Gelên wek *Sûmerî*, *Sûbarî* û *Êlamî* ji pêşiyên wan gelan bûn ku ji wê erdnîgariyê derketin û çûn herêmên hevsê (cîran)[10].

Gênên *Şaristaniya Guzana* di kesayetiya kurdî da ji nifşekî derbas nifşê din bûn. Di dîroka kurdî da ev gên di warên çandî, civakî, siyasî, aborî û hunerî da, ji *Sûmerî*, *Sûbarî* û *Êlamiyan* da bigire, di *Gûtî*, *Horî*, *Kaşşî*, *Manayî*, *Ûrartûyî* û *Madan* ra derbas bibe, heya ku digihîne dewleta Dostikî, dewleta Eyûbî û dewleta Zendî.

Tevî siyaseta xizankirin û nezankirinê ku dagîrkeran beramber gelê Kurd pêkaniye, gênên *Şaristaniya Guzana* hiştin ku Kurd bi hawîrdorên şaristaniyê ra zû bigunce û tevlê bibe;

bihêle ku ew di hemû waran da afrîner be. Bi sedan navdarên Kurd hene yên ku xizmeta dewletan û çandên farisî, erebî û turkî kirine. Ev yek nîşana wê rastiyê ye.

Çarşemb, 09.09.2015

## Jêder

---

[1] Jems Millert: Şaristaniyên here kevin li Rojhilata Nêzîk; rûpel 157.
[2] Mihemed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqî ya kevin, rûpel 20.
[3] Ebdulhemid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 27. Jems Millert: Şaristaniyên here kevin li Rojhilata Nêzîk; rûpel 157, 161, 163.
[4] William Langer: Berfirehiya Dîroka Cîhanê, 1/24. Mihemed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqî ya kevin, rûpel 22-23.
[5] Mihemed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqî ya kevin, rûpel 21-22. Gean Bottero û hinên din: Rojhilata Nêzîk, Şaristaniyên Destpêkî, rûpel 36.
[6] Jems Millert: Şaristaniyên here kevin li Rojhilata Nêzîk; rûpel 162.
[7] Mihemed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqî ya kevin, rûpel 23.
[8] Geofry Bernder: Baweriyên Ayînî li ba Gelan, rûpel 24. Fadil Ebdulwahid Eli: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 210 - 211.
[9] Ehmed Fekhri: Lêkolîn li Dîroka Rojhilata Kevin, rûpel 195.
[10] Arnold Tuinbi: Dîroka Mirovayetiyê, 1/69.